# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (297):

## Armanckirina sivîlan, şewatin fere û mebestkirî di daristanan de, girtinine bêsûcane, binpêkirinên Milîseyên "El'lîwa'i 112", pevçûn, destdirêjîkirin

Li Roja Çarşemê /17/ Tîrmeha borî, "**Mistefa Masetlî** - Waliyê Hetayê ya Turkiyê" serokatiya civateke serokên encûmenên xwecihî û hevrêzkarên Turk li Herêma Efrînê kir, bi beşdariya herdu cîgirên wî û berpirsiyarine ewlekar, û bi parastineke çekdar ji kesayetiya wî re û ta di hundir hola civatê de li avahiya encûmena xwecihî li Efrînê; Û encûmenê got: "Di navboriya civatê de hejmarek dozên girîng li herêmê hatin gotobêjkirin, û yên bêtir li ser rewşa xizmetguzarî, tenduristiyê û kendên têne pêşiya kar bûn"...Ev karanîna wî ji destlatdariyên xwe re, dagîrkeriya Dewleta Turk tekez dike, lê bê ku Turkiyê vê yekê -weke salixeke zagonî ye navdewletî- li xwe mikûr bike, û herweha jî bê ku "parastina daristanan û nixuma geyayî li Efrînê" bibe mijara civatê!




**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Armanckirina sivîlan:**

Li dirêjahiya bêtirî şeş salan, hêzên Dagîrkeriya Turkiyê û milîseyên wê yên Sûrî topebarankirina xwe ji gund, bajarok û bajarên Gundewarê Bakurê Heleb re (yê di bin desteserkirina Artêşa Sûriyê de, bi koçberên Efrînê mişt, û hin jê jî girêdayî Herêma Efrînê) berdewam dikin; Ew sivîl, mal û Avekerên giştiyane armanc dikin, wek:

- Li Siba Çarşemê 31.07.2024an. Z, wan Gundê "Bênê" - Şêrewa topebaran kir, û di encamê de Hemwelatî "**Ebid El'rehîm Xakî Ebid El'xobarî** /95/sal" û kurê wî "**Mihemed Ebid El'rehîm Ebdî El'xobarî** /42/sal" bi kûranî birîndar bûn, û ji bo dermankirinê bo Nexweşxana "Fafînê" hatin rêkirin, û herweha jî ziyanek mezin gihîşte mala wan.



قصف منزل في قرية "بينيه" بناحية شيروا والمصابين "عبد الرحيم خاكي عبد الغباري" و"محمد عبد الرحيم عبدي الغباري"، ١/٧/٢٠٢٤م

**-** Li siba Înê 09.08.2024an. Z, wan derdora Çadirgeha/Kampa "El'ewde" ya taybet bi koçberên Efrînê (ya li nêzîk Gundê "Kişti'arê" - Navça Şera) topebaran kir, û di encamê de keçika negîhayî "**Lîlav Elî Bekir** /15/sal" ji xelkê Gundê "Mûskê" - Navça Reco birîndar bû.



المصابة "ليلاف علي بكر"، ٩/٨/٢٠٢٤م.

**= Şewatên daristanan:**

Li gor serjimariyeke "Berevaniya Sivîl a Sûrî", di navboriya heyva Tîrmeha 2024an. Z de **/55/şewat** di daristanan de vêketin; Tekezkirí ye jî ku piraniya wan li Efrînê ne - li gor nûçeyên wê yên ji aliyê wê ve belavkirî. Û li gor jêderên li ser erdê û weşanên hevgîhana civakî jî, li gel piroseyên qutkirina berdewam agirin fere û mebestkirî bi  daristanên xwezayî û çandinî hatin xistin, û bê ku ji bo vemirandina wan ji aliyê

destlatên Dagîrkeriya Turkiyê û milîseyên bi ser wê ve û Hikometa Hemahengiyê  Demkî tu ked were pêşkêşkirin, ji bilî hin hewildanên "Berevaniya Sivîl a Sûrî", û ji ber wê rûberin mezin ji daristan û dehlan/hirşan rût bûn; Lê hin hemwelatiyan hewildana vemirandina hin agiran kirin, û di heman wextê de bangîn ji bo rizgarkirin û parastina daristan û zeviyên zeytûn, hejîr, kîraz û fistiqan de davêtin!

**Û emê ji wan şewatan van bi bîr wînin:**

**-** Li Roja Çarşemê 07.08.2024an. Z, li Daristana "**Qaziqlî**" - Navça Cindirêsê, li nêzîk gundekî niştecîkirinê.

**-** Li Roja Duşemê 05.08.2024an. Z, di Dehlên/hirşên "**Çiyayê Hawarê**" de, li nêzîk Gundê "Qirigolê" - Navça Bilbilê.

**-** Li şeva 04.08.2024an. Z, di dehlê/hirşê nêzîk Bajaroka "**Kefirsefrê**" de - Navça Cindirêsê.

**-** Li Êvara Înê 02.08.2024an. Z, di dehlê/hirşê nêzîk Gundê "**Bêxçe**" de - Navça Bilbilê.




**-** Li Roja Duşemê 29.07.2024an. Z, du şewatên dehleyî/îhracî li Navça Bilbilê û Gundê "**Mûskê**" - Navça Reco.

**-** Li Roja Yekşemê 28.07.2024an. Z, şewatek di Dehlê "Şemşik" de, li nêzîk Gundê "**Dêrsiwanê**" - Navça Şera.

**-** Li 28.07.2024an. Z, sê şewat li herêmên **dehleyî/îhracî li Gundewarê Reco**.

**-** Li 28.07.2024an. Z, şewatek li dehlên/hirşên Gundê "Mûskê" - Navça Reco.

**-** Li Êvara Yekşemê 28.07.2024an. Z, şewatek li çiyayê Gundê "Dêrwîş" - Navça Reco.

**-** Li rojên 27-28. 07.2024an. Z, li çiyayên Gundê "Şingêlê" - Navça Bilbilê.

**-** Li Roja Şemiyê 27.07.2024an. Z, li dehleke/hirşeke nêzîk Gundê "Erendê" - Navça Şiyê.



**= Girtinine bêsûcane:**

**Destlatên Dagîrkeriyê ev girt:**

**-** Ji bêtirî heyvekê ve, Hemwelatî "**Bahoz Edhem Îbrahîm/Malbata Hemgulî** /27/sal" ji xelkê Gundê "Tilifê" - Rojavayê Bajarê Efrînê, bi tewanbariya têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser (RX) a berê re, ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" ve, piştî gihîştina wî ji ciyê penaberiyê - Herêma Şehba'i/Bakurê Heleb bo gund, û bo Hepsa Maratê ya navendî hate guhestin.

**= Binpêkirinên "El'lîwa'i 112":**

**-** Ji heftakê ve, "**Ebsî El'hemed/Ebas**" - serkêşekî Milîseyên "El'lîwa'i 112" dîkaneke firotina komane ya keskahî û fêkiyan li Bajaroka "Be'idîna" - Navça Reco vekir, û xwediyên dîkanan li heman bajarokê û Gundê "Dumiliya" ya hevcîwar qedexe dike ku herin bazara keskahî û fêkiyan/sûq el'hal li Reco û Efrînê, û wan neçar dike ku tenê ji wî bikirin.


**-** Bi behaneya nebesbûna vêrgiyên /24/ hezar Dolar Emrîkî yên ku li Heyva Pûşpera/Hizêrana borî li ser Kurdan (xelkê Bajaroka Be'idîna û Gundê "Dumiliya") dane ferzkirin, ji bo çaksazkirina riyên ziftê li Bajarokê û gund, "**Ûsame Rehal/Ebo Hesen Obame**" - cîgirê serkêşê "El'lîwa'i 112" rabû vêrgiyeke nû /1000/pere/lîreya Turk li ser xwediyê dîkanekê yan aletê li "Be'dîna" û "Dumiliya" -ji Kurdan tenê- ferz kir, û cara sisiyê jî /500/Perê Turk li ser her yekî ji wan, yanê bi giştî dora /600/hezar perê Turk di herdu carên dawiyê de = 18 hezar Dolar Emrîkî, yanê tibabeke bêtirî lêçûna rasteqîn ji çaksaziyê re, û bê ku li ser anîndeyên Ereb tu tibabeke diravî ji bo çaksazkirina riyan bide ferzkirin, bi ser ku ew anînde ji bêtirî şeş salan ve wan riyan bi kar tînin, û alet û dîkanên li ba wan bêtirî yên Kurdan e.




**-** Endamin ji "El'lîwa'i 112" en dest danîne ser malina li Bajaroka "Be'idîna" ji sala 2018an. Z ve razî nabin ku vala bikin û radestî xwediyan ên vegerîne bikin, û  ew jî ev in: "**Ehmed Mihemed Îbiş/Hecî** - ji salekê ve, **Ebid El'letîf Bekir Şeqîno** - ji sê heyvan ve, **Ezet Reşkêlo** - ji du heyvan ve", û ji ber wê jî ew neçar bûn ku li ba merivên xwe rûnin.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

**-** Li Êvara Yekşemê 28.07.2024an. Z, di nav du giropên Milîseyên "Tîpa/Firqit El'hemzat" de (yên ku "**Ebo Malêk El'dêrî**" û "**Ebo Yûsêf Meyadîn**" ên ji Parêzgeha Dêrezorê serkêşiya wan dikin) pevçûnin derketin, bi sedema nelihevkirinê li ser perçererdekî desteserkirî li nêzîk çûnûhata/Utistirada Rojava ya nû li Bajarê Efrînê, û di encamê de sê sivîl ji anîndeyan -du zarok jî di nav de- rengereng birîndar bûn; Wan sekvan li ser banên avahiyan belav kirin, û rişêşên giran jî bi kar anîn.




Û tê bîranîn ku li 03.06.2024an. Z jî di nav giropa "**Ebo Malêk El'dêrî**/El'hemzat" û giropa "Mistefa El'kehim/Ehrar El'şerqiyê" -li heman ciyî li Bajarê Efrînê- pevçûnin çêbûn, dîsa li ser erdekî hemwelatiyekî Kurd, û di encamê de bêtirî /20/kesan ji anîndeyan -di nav de sivîl- hatin kuştin an birîndarkirin, ziyanin şênberî yen mezin li bajêr çêbûn, û rewşek ji tirs û serberdayetiyê peyda bû; Û li piştî çend rojan serkêşên "El'hemzat û El'şerqiyê" li hev hatin, û "Ebo Malêk El'dêrî" vegerî ciyê xwe, û "Mistefa El'kehim" (ê ku ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" ve hatibû girtin) li 23.06.2024an. Z serbest hate berdan, wekî ku tiştek çênebûbe, û bê ku yek li ser tewanên bûne were cezakirin, û mafên ên ziyan gihîştinê, birîndaran û xwediyê kuştiyan jî li ber bê çû.




**-** Li Êvara Şemiyê 03.08.2024an. Z, li Kampa/çadirgeha dehlê/hirşê Gundê "**Qitmê**" - Navça Şera di nav du giropên anîndeyan de pevçûnin çêbûn, li dû şerekî li ser kûçkê şivanekî  di nav du kesan de, û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" ji bo dawîkirina wê destêwerdan kir, û di encamê de qurşîn li hinan ji wan ketin.



**= Binpêkirinine din:**

- Li Şeva Şemiyê 27.07.2024an. Z, dema ku Hemwelatî "**Arêf Hac Yûsêf kurê Yûsêf**" û hevjîna xwe neçar bûne ku li ba bavê xwe yê temenmezin ê bi tenê razên, giropeke çekdar agir bi mala wî (ya li Gundê "Me'ireskê" - Navça Şera yê di bin desteserkirina Milîseyên hêza hevbeş a El'emşat û El'hemzat de) xistin, û di encamê de ziyanin şênberî yen mezin çêbûn; Û wê giropê du caran berê jî hewildana dizîna malê kiribû.

**-** Ji sê heyvan ve, hevjîna girtî "**Bahoz Edhem Îbrahîm**" û diya wî vegerîn gundê xwe "Tilifê" - Rojavayê Bajarê Efrînê, û daxwaza vegerandina mala xwe kirin, lê çekdarên "Tîpa/Firqit El'hemze" ji Êla "El'mewalî" (yên dest danîne ser wê malê û du malên din ên malbatê ji sala 2018an. Z ve) razî nabin ku vala bikin.

**-** Li vê dawiyê, Milîseyên "Firqit El'hemze" (yên Gundê "Upila" - Navça Bilbilê desteser dikin) rabûn temenmezin "**Mihemed Welo kurê Mihemed Şêxwelîk/Xoce**" sê rojan bend kirin, û ji bo berdana wî /500/Dolar Emrîkî li ser ferz kirin, ji ber ku wî sêtîrek avê bi tirektora xwe -ji ber mijûlbûna wî bi karên xwe- ji wan re peyda nekir.

**Bûyînên çêdibin asta filtandinê ji lêpirsîn û sezakirinê ya serkêş û endamên Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" ya bi ser Turkiyê ve tekez dikin, ew jî di siya serpereştî û parastina "Hikometa Dad û Geşpêdanê" ya ewlekarî û siyasî de ji wan re, ji bo bicihanîn û pêkanîna bîrdoz û armancên xwe yên têvel.**

10.08.2024. Z – 2636. K

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

**-** Serokatîkirina "Mistefa Masetlî - Waliyê Hetayê ya Turkiyê" ji civateke serokên encûmenên xwecihî û hevrêzkarên Turk re, li Herêma Efrînê, 17.07.2024. Z.

**-** Topebarankirina malekê li G. "Bênê" - Navça Şêrewa, û brîndar "Ebid El'rehîm Xakî Ebid El'xobarî" û "Mihemed Ebid El'rehîm Ebdî El'xobarî", 31.07.2024. Z.

**-** Birîndar "Lîlav Elî Bekir", 09.08.2024. Z.

**-** Şewatên daristan û hirşên "Qaziqlî, Çiyayê Hawarê, Kefirsefrê, Bêxçe" li Efrînê.

**-** Şewatên daristan û hirşên "Mûskê, Dêrwîş, Şingêlê, Erendê" li Efrînê.

**-** "Ûsame Rehal" û "Ebsî El'hemed" serkêşên Milîseyên "Lîwa'i 112".

**-** Pevçûnên du giropên ji Milîseyên "Tîpa/Firqit El'hemzat" li Bajarê Efrînê, 28.07.2024. Z.

**-** Serkêşên giropine çekdar en lihevxistî "Ebo Malêk El'dêrî, Ebo Yûsêf Meyadîn, Mistefa El'kehim".

**-** Pevçûnên kampa hirşê Gundê "Qitmê" - N. Şera, 03.08.2024. Z.